Pirojeyê Foler yê parçekirina Îraqê ber bi kû ve?

Ebdulhusên Şeban
Wergêran: Arî Mihemed

Xuya ye ku kargêriya serokê Emrîkî Corc Boş hêşta nîgeran e derbareyî hilbijartinên xwe, ji ber egerê siyaseta wê ya di van çar sal û nîvên borî de li Îraqê ku tûşî giriftarî û astengan bûye. Lewra jî dest bi saxkirina wan piroje û nexşeyên hilgirîn kiriye. Dûmahîk piroje jî ,pirojeyên Cozif Baydin e, sînetorê demokrat derbareyî parçekirina Îraqê bo sê herêmên: Kurdî, Sinî û Şî'î li jêr sîbera hukûmeta merkezî ya êkgirtî. Lê hukûmeteka lawaz û bê desthelat.

Kargêriya serok Boş çend amajeyên erênî derbareyî pirojeyê Baydin diyarkirine, ku bo demekê dirêj toz li ser mabû. Lê weku jêderên rojnemevanî diyardikin, ku çend endamên kongirisê, dîdar û çavpêketin di gel xwediyê pêşniyazê peyda kirîne û hatiye diyar kirin ku vî pirojeyî bersivdanên erînî hene. Li pey nexşê Baydin jî, parçekirina Îraqê, rêka çareseriyê bi tenê ye ku ev rewşa aloz û xwînawî bi dawî bihêt, bi taybet jî, kurdan pirojeya Fedralî heye û her wesa partên şî'an (Civata Îsalamiya Bilind û parta Dewa) û heta hindek aliyên rikeber, lê ji aliyê armancan ve giropê Muqtede Elsedir çu cudahî nînin ku ev aliye jî hêzên herî serekîne ku di çarcûveya giropên pişikdar de di pirosêsa siyasiya Îraqê û pêkhateya hukûmetê û perlemanî de kar dikin. Dihê gotin ku pirojeyê Baydin bersiva wan pirsiyaran bi xwe ve digire yên Foler ji dezgehê Rand yê Emirîkî li destpêka salên 90 danaye ber singê kargiriya Emirîkî ku bi aşkereyî gotibû: erê Îraq li sala 2002-ê yekgirtî bimîne? Pirsyarên wî jî komeka nîşanên pirsê bi xwe ve digire ku sînariyo û pêşniyazên ne li ber çav li dor paşeroja Îraqê diyar kirbûn, her wesa ew xalên peywendî bi arastekirinên Emirîka yên stratîcî û bi taybet li gel

dûmahiya şerê Îraq û Îranê, nemaze piştî serdagirtina hêzên Îraqê bo ser dewleta Kuwêtê li eylûna sala 1990-ê, li wî demî metirsiya pirsiyara Foler û wan encamên bi xwe ve digire, diyar kir. Ji aliyekê din ve, bo hindekan wesa hate pêş ku pirsyara Folerî, Baydin li ser berka ketwarî raêxist, bê ku bîrkirina rastiyên ciyo siyasî û sisyo-dîrokî berçav bigire.

Ji navbirina dezgehên dewleta Îraqê û bi taybet dezgehên leşkerî û emnî bi bihaneya hindê ku girêdayî rijêma Sedamî bûn, dergeh li ber paşeroja Îraqa nû vekir ku ser ji nû pêkhateya wê bihê danan ku li dû taîfe û etniya bihê perçekirin. Wesa jî, babetê parçekirina Îraqê bi gelek navnîşanan hate pêş ku carekê bi navê fedraliyê û caran jî bi navê behra herêman ji dihatiyê petrolê û caran jî bi navê maf û behra taîfe û etniyan. Belku nexşeyê Pol Pirêmer, hakimê sivêlê Emirîkî li Îraqê, yekemîn serbor bû bo çawaniya bi cih anîa pirsiyara Foler. Wesa nexşeya siyasiya Îraqê bi kend û kûr û alozî ve, dihê pêş, bi wê pileyê ku stratijiya dewleteka zilhêza cîhanê bihê têkdan zêdebarî têkçûna pirosêsa siyasî û hebûna kiryarên têkder li Îraqê bi taybet piştî vekêşana bereyê Tewafiq ji hukûmeta Îraqê û rexneya çend aliyên din yên siyasî li vê piroseyê. Van hemû kêşeyan wekir ku kargêriya Boşî li çareseryan bigere, bi taybet piştî raspardeyên giropa vekolînên Îraqê (Îraq studies Grop) li gel dîtinên serokî, neguncayîne, ku raspardeyên lijna Cêmis Bêkir, wezîrê derveyê Emirîka yê berê û Lî Hemilton endamê kongirêsî (ji deh endamên komarî û dîmokrat pêk dihat) çend pêşniyaz ji bo çareseriya kêşeya Îraqê danabûn, ji wan jî pişikdariya dewletên cîranên Îraqê wek Sûriya û Îranê di çareserkirina kêşeyên Îraqê de, di gel destpêka sala 2008-ê, dest bi vekêşana hêzên Emirîk bihête kirin. Her wesa pirsa aştbûna nîştimanî ser bikeve û bazneya pişikdariyê di pirosa siyasiya Îarqê de, bihête berferhkirin û hêzên çekdar bihêne ji navbirin û çaksaziyên aborî û civakî, xizmetgozarî bihêne encamdan. Belê serokê Emirîka li dawiya 2006-ê ev pêşniyaz e ragirtin û tenê li vê dûmahiyê dest bi hindek ji wan kiriye ku bi cih bihîne weku destpêkirina danûstandinan li gel Îranê ku her ji sala 1980-ê were û li gel peydabûna aloziya desteserkiriyên Emirîka ji layê Îranê ve peywendî hatibûn birîn.

Lê giropa vekolînan li ser rewşa Îraqê dike, pirojeyê Baydin bi tiştek navokî dibîne û egeran jî bo pêkhateya civakê Îraqê vedigerînin û diyar dike ku xwîna wan li gel hev têkelbûye û bûne xizim û êdî di şiyan de nîne bihêne veqetandin. Her wesa helwîstên dewletên cîranên Îraqê bi taybet jî Erebistan Sudiyê û Urdin, zêdebarî hebûna

Sûriya û Tirkiya, pirojeyê Baydin xuya dike ku belku xalên di vê pirojeyê de hatîn, ne li ast bin. Lê ji bona qonaxa niho ya Îraqê tê de dijîn baştirîn çareserî ye ji bo bi dûmahîanîna nakokiyên taîfî û etnî.
Lê pirojeyê Baydin li gel pirojyê Cozêv Êdward ji peymangeha Pirokîngiz diyar dike ku xwandineka baş ji bo parçekirina Îraqê, ne hatiye kirin. Çunku parçekirin dê welatê Îraqê ber bi şerûşoran bibe û nearamî wê peyda bibe. Ji ber ku cudahiyek mezin di navbera Îraqê û Bosna de heye. Belê cîranên Bosne hez dikirin ew bihête parçekirin lê cîranên Îraqê, naxwazin parçebûna wê bibînin. Pirojeyê navbirî li ser sinoran disekine û dibêje: aloziyek ji bo hebûna sinorên herêman heye, bi taybet Kerkûk û Mûsil û Bexda wê bikevine li kîjan herêman? Bexda jî bi bajêrek dewletî hijmartiye, belê Êdward dibêje ku divê çend xalek ji destûrê Îraqê bihêne guhorîn, da ku di şiyan de be sinor bihêne danan û parçekirina Îraqê asan bibe.
Piştî nexşekirina sinoran, ku kartêkirinê li ser piroseya belavkirina samanên petrolê neke, her dîsan divê rênimayên vebir ji bo parastina herêman û qedexekirina veguhastina welatiyan ji herêmekî bo herêmeka din bihête kirina û pêdiviye jî nasnameyên taybet bi her herêmekê ve û xalên pişkinînê li ser sinorên herêman bihêne danan bi merema nehêlana giropên tundrew. Bo vê pirosê jî pêdivî bi milyar dolaran û 300000 serbazan heye da ku bikarin sinorên herêman biparêzin.
Aya pêşbîniya Foler dê hête bi cih înan ku niho xwe bilind di nav kêşeya Îraqê de dibîne, yan jî stratijiya Waşinton dê pêdivî bi guhorînan be û dê vekêşana hêzên xwe rabigihîne û lîsteyeka demkî jî bihête destnîşankirin û rolên Neteweyên Yekgirtî wê li Îraqê berfireh bibe li dû pirojeyê Emirîka û Birêtaniya pêşniyaz kirî.